Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 114
6'ê Tîrmeha 2009
Buha: 150 Tûmen

agirî

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

**Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ Ji Bo Piştgirî Ji Serhildana Xelkê Îranê**

*Rûpela 2...*

# RÊZGİRTİN Jİ ŞEHÎD DR. QASİMLO Û ŞERMEZARKİRİNA TERORÎZMA KOMARA ÎSLAMÎ ERKEK NETEWEYÎ YE

Di 13'ê Tîrmeha 2009'an de, 20 sal bi ser teror û şehîdkirina rêberê navdar yê gelê Kurd û Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hevalên wî li Viyena Otrîşê bi destê terorîstên cinayetkar ên Komara Îslamî a Îranê derbas dibe. Dr. Qasimlo û kekê Ebdula Qadirî Azer bi armanca gotûbêj bona çareserkirina aştîxwazane a doza berheq û demokratîk ya Kurd li Îranê çûbûn Viyenayê ku bi destê nûnerên şandî yên rejîma Îslamî a Îranê hatin teror û şehîdkirin. Heta niha bikujên wê cinayetê neketine destê dad û edaletê û her wê demê dewlet û Polîsê wî çaxî yê Avustryayê bêy tu lêpirsîn û lêkolîneke ji wan bo Tehranê hatin şandin!!! û dosyaya vê cinayeta nemirovane bi dijî wî rêberê mezin yê Kurd hêj neketiye ser maseya dadgehê. Belge û dokumentên vê kiryara cinayetkarane a terorîstên Komara Îslamî roj bi roj zêdetir kifş û eşkere dibin. Bi taybet vê mehê eşkere bû ku Ehmedînejad yek ji wan kesan bûye ku çekên vê kiryara terorîstî kirîne û di wê cinayetê de dest hebûye.


Bi hilkevta 20'emîn salvegera terorkirina rêberê navdar yê Kurd, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hevalên wî, Desteya Rêveber ya rêzgirtin ji Şehîd Dr. Qasimlo, daxuyaniyek bo raya giştî û xelkê Rojhilatê Kurdistanê belav kiriye û tê de daxwaz hatiye kirin ku bi lidarxistianna girevek giştî a nerazîbûnê di awa û şeklên aştîxwazane û sivîl de rêzê li rêberê xwe yê navdar bigirin û her wiha siyaseta terorîstperwerane ya rejîma Komara Îslamî mehkûm û şermezar bikin.



**Agahiyên berfirehtir di rûpela 6 a vê hejmara Agirî de...**





**Komara diz û derewînan** (Beşa 2) 3



**Rehmanê Min** Karel Jech 4



**Perwedehiya Zanistî** 9



www.arsivakurd.org

# Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ Ji Bo Piştgirî Ji Serhildana Xelkê Îranê

**Hevwelatiyên hêja! Xelkê xebatkar yê Kurdistanê!**

**Kom û komeleyên mirovhez!**

Her weke hûn haydar in, piştî ragihandina encama bi nav hilbijartina dehemîn gerra Serok Komariyê di roja 22'ê Cozerdana 1388'an a Rojî (12.06.2009) li Îranê û diyarîkirina mohreyekî dilxwazê Weliyê Feqîh û dar û destekên wî, pêleke nerazîbûnê li seranserê Îranê û li deveyî welêt dest pê kiriye û li Tehran û bajarên mezin yên din ên Îranê, xelkê nerazî rijiyane ser rê û şeqaman û bi dana dirûşmên cur bi cur, rewayî û berheqbûna vê bi nav hilbijartinê xistin bin pirsê.

PDKÎ berî destpêkirina vê şanosaziyê, di daxuyaniyeke fermî de bi şirovekirina hûr û kûr, ev bi nav hilbijartine baykut kir û daxwaz ji civatên xelkê kir, di vê şanogeriyê de beşdariyê nekin, ji ber ku azmûna rejîma Komara Îslamî ya Îranê û qanûnên paşverû yên sîstema Wilayeta Feqîh nîşan daye ku herî kêm nirx û biha bi dengê xelkê û vîn û îradeya gel ji aliyê vê tê dayîn Rastbûna vê helwêsta durust hate cî û careke din di vê bi nav hilbijartinêde berbijarê dilxwaz ê Weliyê Feqîh hate îlankirin. Berendamek ku di terorkirina rêberê navdar yê Kurd Dr. Qasimlo de dest hebûye û careke din dosyaya wê terorê yê bûye basa kom û komeleyên navneteweyî. Encama vê bi nav hilbijartinê bo me tiştеke çavnihêrkirî bû, çunkî bi baweriya me, hilbijartinek bi wateya hilbijartinê nehatiye kirin û ne tu yek ji berendaman di axavtin û bernameyên xwe de ji bo gelê Kurd û neteweyên din ên Îranê tiştek bingehîn bas kirine û ne ew sîsteme keys û derfeta çareserkirina pirsgirêkên sereke û bingehîn ji rêya gotûbêjê re dide, heta ku ji rêya hilbijartinê ve jî xelkê di birêvebirina welat de beşdar bike.

Encama vê siyaseta hişk û girtî a rejîmê ku civatên xelkê wiha lê bêzar bûne û ji derfetekê digerin ku kerb û bêzariya xwe ji vê rejîmê bidin xuyakirin, liv û tevgera giştî a xelkê ku di van çend rojane de dest pê kiriye, her ji ber vê rastiyê ye ku ji bo rejîma Komara Îslamî, dengê xelkê girîng nîne, bang û hawara xelkê jî bi vî awayî bersiv dide ku em di şeqaman de dibînin û di ragihandinên giştî ên cîhanî de jî hate belavkirin û hate nîşandan ku hêzên serkutker û cinayetkar bi fermana Weliyê Feqîh çawa yê ketine canê xelkê û bêrehmane xelkê qir dikin û keç û xortên wî welatî weke dîktatorên berî xwe şehîd dikin û rapêçî girtîgehên xwe dikin, nemaze piştî gefxwarinên Xameneyî di nimêja înê a Tehranê di roja 19'ê Hezîrana 2009'an de, xelk ji gefên wî netirsiyan û xwenîşandana xwe domandin û bi vî awayî rejîma Wilayeta Feqîh û xelkê azadîxwaz bi tevahî li hemberî hev sekinîn.

PDKÎ her weke berê helwêsta xwe ragihandiye, di vê rewşa hesas de careke din, helwêsta siyasî a xwe derheq van xwenîşandanane îlan dike û serkut û qirkirina bêrehmane a xelkê azadîxwaz yê welatê me ji aliyê hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve bi tundî mehkûm û şermezar dike. Ji wan siyaset, dirûşm û helwestane jî piştevaniyê dike ku di xizmeta cihgir kirin û misogerbûna azadî, demokrasî, federalîzm û nirx û bihayên mirovî de be. Li gor vê nêrînê, em piştgiriyê ji wê tevgera giştî a xelkê dikin ku armanca dawî a wê gihîştina neteweyên maf bêpeskirî yên Îranê bi sîstemeke demokratîk û federal be û civatên xelkê bo yekcarî ji dîktatorî û kevneperestiyê rizgar bike.

PDKÎ ji bo pêkhatina van armancan jî piştevaniyê ji xelkê serhilder yê welatê me li dijî rejîma dîktator a Komara Îslamî a Îranê dike û di wê bawerê de ye, ji bo paşekêşekirin bi rejîma dîktator a Komara Îslamî:

- Erkê kom û komeleyên mirovdost ên cîhanê ye ku piştîvaniyê ji daxwazên berheq ên xelkê bikin û rêyê nedin Komara Îslamî ji vê zêdetir cinayetan bimeşîne û xelkê qir bike.
- Hemû girtiyên siyasî li seranserê Îranê serbest bihên berdan.
- Pirsgirêka sereke, qanûna kevneperest a Komara Îslamî ye, lewra divêt qanûna bingehîn bihê hilweşandin û yasayek demokratîk û dadperwerane ya cihê qebûla gelên Îranê ciyê wê bigire.
- Her wiha em daxwaza zêrevanî û çavdêriya kom û komeleyên mirovhez ji bo dabînbûna tenahiya canê çalakên siyasî û sivîl dikin. Partiya me li ser helwesta jêhatî a xwe tekezê dike û daxwazê ji hêzên siyasî ên Îranê û Kurdistanê dike, bi şîrove û analîzeke hûrbûnane û siyasî û dûr ji li pey ketina aliyên têkildar bi sîstema Wilayeta Feqîh ku tenê fikrê bi parastina rejîmê û berjewediyên xwe dikin, helwestê bigirin û her wiha bi hevkarî û xebata hevbeş li ser bernameyeke diyarîkirî, piştgiriya vê pêvajoyê bikin. Dîroka tevgerên rizgarîxwaz ên gelan di rêya xebat ji bo gihîştin bi mafên xwe nîşan daye ku bi yekîtî û hevgirtinê digihîjin armancên xwe.

**Bi hêviya pêkhatina Îranek demokratîk û federal**

**Neman ji bo rejîma dîktator ya Komara Îslamî**

**Serkeve xebata azadîxweazane a neteweyên Îranê**

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**22.06.2009**
**01.04.1388**

www.arsivakurdi.org

## RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

**Ebdullah Hicab**



# Komara diz û derewînan

**(beşa 2)**

**Berxwedana li hember Komara Îslamî**

Pêla yekemîn a berxwedana li hember pîvanên desthilatariyê û siyaseta Komara Îslamî, di rojên destpêka jiyana vê rêjîmê de, li Kurdistanê re dest pê kir. "Ne"-ya ku gelê Kurd bi daxwaziya PDKÎ û hêzên din yên Kurdistanî li sala 1980'an ji rêjîma nû re got, riya gelê Kurd û qedera gel ji ya rejîma nû cuda kir. Lê ew "ne" bi tenê û xwe serî xwe têrê nekir ku pêşiya damezirandina sîstemek dijî demokratîk li Îrana piştî desthilatariya şah were girtin. Rêjîma nû, hemû rêxistin û partiyên pêşverû û demokrasîxwaz li Kurdistan û hemû Îranê, bi hev re, ji xwe re kirin armanc û di nava demek kin de pêla girtin û kuştinê da destpêkirin.

Dema tu derfetên têkoşîna legal (yasayî) nema, hêzên pêşverû, bi baweriya guhartina rêjîmê daketin meydana têkoşîna li hember Komara Îslamî. Sal hatin û çûn û mewdaya di navbera demokrasiya ku gelên Îranê dixwestin û dîktatoriya ku Komara Îslamî damezirandibû de pitir bû. Her çend Komara Îslamî hewl da ku nifşek nû li gor pîvan û xwestekên xwe yên paşverû perwerde bike, lê di dawiya salên 90 de, ev car her ev nifşa nû, li hember rêjîmê serî hilda. Êdî opozîsiyona ku ji destpêka jiyana Komara Îslamî ve, li hember rêjîmê ber xwe dida, bû xwediyê hêzek ciwan ku ji rêjîmê û duruşm û pilan û pîvanên wê bêzar bûbû.

Xwesteka guhertinên siyasî, ku ev car ji hundir re dest pê kir, bi daxwaziya jiyanek ewle, bi rifah û azad hate meydanê. Qonaxa nû bi hilbijartinên dewreya 6'ê ya parlemanê dest pê kir û di her du dewreyên serokkomariya Muhemed Xatemî de ji rojeva civakê der neket. Pêvajo bi nîqaşên li ser bingeha cumhûriyet û mafê hevwelatiyan dest pê kir ku ji aliyê rewşenbîrên ku beşdariya xebata ji bo damezirandina rêjîma nû bûbûn ve hate rojevê. Sala 1997'an Muhemed Xatemî, bi soza ku dê sînorekê ji tundajoyiyê re danê, bû serokkomar. 3 sal pişt re, di hilbijartinên parlemanê de, eniyek ji kesayetiyên alîgirê guhertinan ava bû.

Lê digel ku hemûyan bas ji guhertin li gor Qanûna Bingehîn û di çarçoveya sîstemê de dikirin, dîsan jî sîstema Wilayetê Feqîh rê neda ku tevgera guhertinxwazya hundir pêşve here. Lewma hêzên tundajo dubare daketin kolanan û riya vegeşîna tevgera ku li ser navê guhertinxwaziyê dixwest rûyek din ji Komara Îslamî nîşan bide, girtin. Her du hilbijartinên parlemanê li salên 2004 û 2008'an li ser şopa siyaseta tundajo ku eniya alîgirê Xameneyî dimeşîne, birêve çûn û encam jî her bi destê wan tundajoyan hatin diyarkirin.

Tevgera ku ji dema Xatemî ve, li ser navê reformxwaziyê kar dikir, weke rojên destpêka jiyana xwe ya siyasî, di pêvajoya hilbijartina nû ya Ehmedînijad de, dubare bi astengên yasayî û piratîkî re rûbirû bû. Serbarê hemû astengiyan, tevgerê bi xwe jî nekarî bi pilanek eşkere bo guhertinên siyasî û yasayî têkeve meydana kêbirkiyê. Gotin, vê carê jî her weke serdema Xatemî pitir di çarçoveya durişmeyên giştî de man. Di vê navê de helwêsta herî eşkere, ya serokkomarê berê, Muhemed Xatemî û hevbîrên wî bû bu ku weke serdema serokkomariyê, dîsan ragehand ku dixwaze " her guhertinek îhtimalî di çarçoveya Qanûna Bingehîn ya welat de û li bin sîvanê desthilata Wilayetê Feqîh" bê meşandin.

Di nava eniya reformxwaz de kesên ku dixwestin Xatemî, Mûsewî û kesayetiyên mîna wan bikin fîltêrek ji bo pêşvebirina pêvajoya guhertinên bingehîn jî hebûn. Ewan, gotinên serokkomarê berê û hevbîrên wî weke manovreke siyasî temaşe dikirin ku ji bo aramkirina rewşê û kêmkirina hesasiyetan pêwîst bûn. Lê pêvajoyê di meşa xwe de tiştek din nîşan da.

Hilbijartina serokkomariyê li meha derbasbûyî dubare nîşan da ku astengiya mezin li ser riya guhertinan, xên ji bêpilaniya reformîstan, çarçoveya sîstema siyasî ya welat e ku desthilata sereke di dest wan organên rêveberiyê de dihêle ku ji aliyê gelên Îranê ve nayên hilbijartin. Sîstem di bingeha xwe de xitimî ye û derfeta çaksazî û nûjenkirinê nade. Di nava hin faktorên sereke de ku rê ji ber guhertinan digrin, faktorên jêrîn sereke ne:

1. **Welayetê Feqîh** ku desthilata herî bilind ya siyasî ya welat dixe destê serokê olî an Weliyê Feqîh de. Bi awayê fermî serokê olî ji aliyê Civata Zanayên Hilbijarte (Meclisê Xubregan) ve tê "hilbijartin". Ew civat ji mela û pisporên olî pêk hatiye ku di pêvajoyek cuda ji ya hilbijartina parlemanê, bi riya hilbijartinek taybet, tê diyarkirin. Serokê olî, li warê destûrî ve, berpirsiyarê hêzên çekdar, hêza dadwerî (Quwey Qezaiye), hêza yasadanan û Konseya Parêzvanan e. Lê di piratîkê de pozîsyona wî li serveyî Parleman, Serokkomar û hemû dezgehên siyasî û îdarî yên welat e. Dema Parleman û Serokkomar tên hilbijartin, heta ji aliyê rêberê olî ve neyên pejirandin, tu ji wan fermiyetê peyda nakin. Piratîka rêveberiyê jî bi awayekê ye ku hemû biryarên siyasî dibe ji aliyê Rêber an nûnerên wî ve bêne erêkirin. Dema ev bi pêvajoyekê re nebe, îmkan nîne biryarek siyasî bê pejirandin an derbasî jiyanê bibe.

2. **Konseya Nobedar an Şêwra Nobedar** ku ji 12 endaman pêk tê. Endamên konseyê ji bo 6 salan têne diyarkirin. Ji endaman, 6 kes mele ne û rasterast ji aliyê serokê olî ve têne diyarkirin û 6 kes jî yasanasên îslamî ne ku parleman ewan di nava berendamên ku ji aliyê desthilata Bilind ya Dadweriyê ve têne nasandin, hildibijêre. Heya ku Şêwra Nobedar ciyê xwe negre, Parleman fermiyetê nagire û nikare dest bi karê fermî bike. Erkê fermî yê wê dezgehê ew e ku biryarên parlemanê li gor yasayên şerîetê binirxîne û biryara dawî li ser hemû mijarên Parlemanê dipejirîne bide. Ji ber ku di navbera wê konseyê û parlemanê de dijberî dernekeve, sala 1997 organek nû bi navê Koma Diyarkirina Berjewendiyên Rêjîmê (Mecmeî Teşxîsê Meslehetê Nizam) li bin serokatiya meleyê xwedî bandor yê Îranê, Haşimî Refsencanî hate avakirin. Lê di wan salên dawî de ji ber ku Parleman û Konseya Parêzvan li ser şopekê dimeşin, rola Konseya Refsencanî kêmtir bûye.

Yek ji wezîfeyên Konseya Nobedar jî, erêkirina berendamên serokkomariyê ye. Ev pozîsiyon desthilat û gotina dawî ji bo diyarîkirina serokê nû dide konseyê.


3. **Qanûna Bingehîn**, bi taybet xalên 91, 93, 98, 99 û hwd ku qedera biryarên parlemanê dide dest saziyên weke "Şûrayê Nigehban" û serokê olî. Ji wê bi der jî pitir ji 100 xalên din ji 173 xalên bingehîn yên Yasaya Giştî ya Îranê, ku piştî şoreşa sala 1979'an hatiye amadekirin, li dijî pirensîpên demokrasî û mafên mirovan in. Mekanîzmên ku ji bo rêveberiyê hatine danîn, rê nadin ew yasa ji aliyê parlemanê ve bê guhertin an sererastkirin. Bi taybet ji ber ku hemû biryar pêwîst e ji aliyê Konseya parêzvan ve bêne pejirandin û "erê"ya serokê olî jî pêre be.

4. **"Quwey Qezaiye"** an hêza dadweriya welat ku ji aliyê nûnerê taybet yê serokê olî ve birêve diçe. Li gor yasayê pêwîst e hêza dadweriyê serbixwe (ser bi rêberê olî) be û desttêwerdana piratîka

**Dûm di rûpela 5'an de**

www.arsivakurd.org

# Rehmanê Min



**Karel Jech***
**Prag 08.06.2009**

Ebdulrehman bi paşnavê Qasimlo ku navê gund û geliyê bavê wî bû, min di xoraniya xwe de nas kiribû, em her du ji xortên şerê cîhanî yê duyemîn bûn, di dema şer de, ez li komara Çekê di bin zilma Hîtler de jiyabûm, ew jî hezaran kîlometran dûrî me li Îranê jiyabû. Me her duyan hê di xortaniya xwe de hem şahiya demokrasiyê û hem jî zilma rejîmên zordar nas kiribû. Wî kulîlkên şahiya Komara Kurdistanê li Mehabadê bêhn kiribû û her wiha zilma hêzên zordar li perçiqandina van kulûlkên azadî û demokrasiyê di Komara Kurdistanê de... Ew tirajediya Komara Kurdistanê ku rehmetî dîtibû, pê re jiyabû, tu car ji bîr nekir û bûbû perçeyek ji hebûna wî. Piştî vê trajediyê êdî nexwastibû li Îranê bimîne û koç kiribû Ewropa. Dora salekê li Firansa ma û xwend û di vê navberê de burs ji Saziya Yekîtiya Xwendekarên Cîhanê wergirt û hate komara Çekoslovakya bo xwendina bilind di zanîngehê de.

Her di destpêka hatina xwe de, zanîna wî li ser pirsên siyasî, civakî, zanîna wî ya li ser ziman ew qas bihêz bû ku rasterast dest bi xwendina di kilasa 2 ya zanîngeha zanistên siyasî û civakî li Pragê kir. Em xwendekarên Çekî tevde heyrî mabûn ku ew wekî biyanî bêy ku kilasa 1 bixwîne, çawa rasterast derbasî kilasa du bû! Piştî demekî kurt, êdî her kesê di zanîngehê de dizanibû ku Rehman jîrtirîn û zîrektirîn xwendekarê zanîngehê ye û her wisa wî xwe serkevtî dabû qebûlkirin. Di xwendinê de bala wî ji her tiştî zêdetir pirsên aboriya navneteweyî û danûstandinên siyasî yên nava welatan dikişand.

Di demekî gellek kurt de, ne tenê xwendekarên zanîngeha me, heta xwendekarên zanîngehên din yên Komara Çekê jî Rehman wek berdevek û berpirsiyarê xwe hilbijartibûn. Tu car ramanên xwe yên Çepîtiyê nediveşart. Çepîtiya wî ji ruhiyeta wî a civakî, ji xwendina edebiyatê, ji serpêhatiya wî di nav Komara Kurdistanê li Mehabadê û ji mayîna wî di Fransa de dihat. Lê di nava demekî kurt de, xetereyên dogmatîzmê û terîqetên nûjen yên komunîzma Soviyetê jî nas kir û eva bû sedema dûrketina wî ji partiya "TUDE" ya Îranê ku tenê îdeolojiya Komunîzma Soviyetê nas dikir.

Bexteweriya me her duyan ew bû ku, her di destpêka xwendina me de, em dabûn nava odeyekî di avahiya xwendekaran de ya bi navê "Rooswelt" di kolana "Opletalova" de li bajarê Pragê. Heta dawiya xwendinê, 5 sal em bi hev re di nava wê odê de man. Bi roj di zanîngehê de, bi şev di vê odê de em timî bi hev re bûn. Me weke du xort derd û kul, şahî û kêfa xortaniyê bi hev re parve dikir, tu kesekî din li nêzîkê me tune bû. Wî kesên xwe yên nêzîk li Kurdistanê hiştibû û em ji hev re bûbûn dê û bav, heval û hogir, dostên can'... . Piştî xwendinê jî me nexwast em ji hev dûr bikevin. Me du mal di kêleka hev de di taxa "Petrin" li bajarê Pragê de girt û em îcar jî bûn cîran... .

Di destpêkê de ku me hevdu nas kiribû, li ser daxwaza Rehman min ew fêrî zimanê Çekî kir, şaşiyên wî yên gramera Çekî rast dikir, lê piştî demeke pirr kurt, êdî ev yek pêwîst nebû. Rehman ewqas jîr bû ku ne tenê êdî bi zimanê edebî weke me xeber dida, belku zaravên zimanê Çekî di devê wî de bûbûn hevîr. Êdî bi wî zimanê zikmakî ez pê re rojane ne tenê li ser pirsên siyaseta cîhanê, her wisa em li ser derd û kulên jiyanê jî dipeyivîn û eva bû sedema din ya dostaniya me heta mirinê... . Ev dostîniya bê mînak ne tenê di nava me de mabû, piştî ku Rehman mala me di Çiyayê "Orlicky" bû, em ziyaret kirin û bû dost û neferekî malbata me. Di şevên dirêj de, li ser Çiyayê "Orlicky", di mala me de ji malbatê re bi seetan wek Çîrokbêjekî bê hempa bi zimanekî zelal qala Kurdistana xwe ya dûr, lê şirîn dikir. Şevan me weke malbat dev vekirî heta berê sibê guh dida çîrokên wî yên balkêş û rengîn li ser Kurdistana wî. Bi çayên kurdî, tahma çîrokên Kurdistanê dawî nedihat û em li hêviya şevekî nû diman ku Rehman bi xwe re ji bo me deriyên nû yên dinyayekî nenas vedikir. Hember şevan, di nava rojê de, Rehman dikete nava gundiyên me û dixwast her tiştê wan nas bike, jiyan û xebat, kêf û xemgînî û raman û armancên wan. Bavê min mamosta û qayîmmeqamê çiyayê me bû û di dema şerê cîhanê de li dijî Hîtler li ser van çiyayan şer kiribû. Rehman di nava rojê de bi seetan bi wî re dima, sedan pirs li ser şerê ji bo azadiyê, li ser mamostayî û li ser sîstema dewletê dikir û bavê min jî bi kêf û şahî jê re wek mamostayekî şexsî, wek bavê ku bêy ku biweste, îzah dikir, digot û ciyên şer nîşanî Rehman dida.



Dr. Qasimlo û Karel Jech, Gulana 1951'an - Pirag

Bavê min matmayî mabû ku kesek ku hezaran kîlometran dûr ji Kurdistanê - efsaneyek ku mirov li ser xarîtan jî nedidît - bo çi van tiştan dixwaze hîn bibe û nas bike û li ser de bifikire? Dayîk û xûşka min ji Rehman hînî patina xwarinên kurdî dibûn û ew wekî neferekî malbata me dihesibandin.

Demeke kurt piştî xilaskirina xwendina zanîngehê, Rehman êdî xwe ji bo şerê li dijî rejîma zilmkar ya Şahenşahî amade hesiband û ji bo tekoşînê vegeriya Îranê. Ji bo vî şerî, bi xwe re tenê pirtûk dibir. Bona ku pirtûk di ketina wî ya Îranê de nehên girtin, me tev bi malbatî bergên pirtûkan guhartin û li ser pirtûkên siyasî û zanistî, bergên pirtûkên evînî û helbestan zeliqand. Rehman û pirtûk tu car ji hev nediveqetiyan. Rehman di wê demê de dixwast bi xwendekareke bi navê "Helena" re bizewice. Karê zewacê wext dixwast. Lê Rehman dixwast rojekî zûtir bigihîje eniya şerê li dijî Şahê Îranê. Dezgirtiya wî li vir ma. Piştî ku Rehman gihîşte Îranê, ji min re ji balyozxaneya Çekoslovakyayê li Tehranê wekaletnameyek amade kir û şand ta ku ez di ciyê wî de bi Helena re herim şaredariya Prag û balyozxaneya Îranê li Pragê û bi Helena re kaxizên zewacê di ciyê wî de îmza bikim. Di dîroka Komara Çekoslovakyayê de cara yekem tiştekî wusa pêk dihat û ez di ciyê Rehman de bi Helena re çûm zewacê û min kaxiz îmza kir ta ku Helena bikaribe bi fermî wek jina wî here Îranê. Me her tişt amade kir ta ku Helena rojkî zûtir bigihîje Rehman û me ew şand Îranê. Bi vê riya cefa, kul û tekoşînê malbatekî Kurd û Çek pêk hat. Ji wê zewacê û malbata Kurd û Çek du zarok hatin dinê, **Mîna** û **Hîwa**. Ev malbata Kurd û Çek bi hev re salan bi dizî li Îranê man û dijî rejîma xwînxar ya Şahê Îranê têkoşîn dan.

Piştî salan vegera wan ya ji Îran bo Pragê mimkin bû, me salên hesretiyê dûr hiştibûn û em dîsa bi hev re bûn, di kêleka hev de rûdiniştin, rojane jî Rehman di zanîngeha aborîya navneteweyî, min di zanîngeha dîroka aborî, xanima wî Helena jî di zanîngeha zimanan de dersa zimanê Îngilîzî dida. 2 zarokên wî û 3 zarokên min car di mala wî de, car di mala min de bihev re mezin dibûn.

Raste ku Rehman pisporekî bê hempa di warê aboriya navnetewî de bû, lê dîsa jî timî di dilê wî, di hebûna wî de danaskirina tekoşîna gelê Kurd li hember neheqî, zilm, bêhiqûqiyê hebû. Ji aliyekê bi pirsên aborîya cîhanê re mijûl dibû, lê ji aliyê din ta ku wext û mecal dest dida, pirsên gelê xwe yê bindest bi gotar, semînaran û bi weşandina pirtûkan dianî cî. Di vê navberê de di sala 1964'an de, li peytaxta Komara Slovakya, pirtûka xwe ya **Kurd û Kurdistan** bi zimanê Slovakî weşand. Ev pirtûk di wan salan de yekemîn pirtûka lêkolînî ya li ser pirsa Kurd û Kurdistanê di Ewropayê de bû. Danûstandinên xwe yên zanistî, zanyarî û siyasî bi serokên Rojhilata

Navîn re timî diparast. Carcar bi Serok Mistafa Barzanî û Celal Talebanî re dihatin ba hev. Tevde qîmetekî bilind didan dîtin û ramanên wî. Li Ewropa deriyê piraniya serokan jê re, wek yekemîn Kurd tim vekirî bû. Dostaniya ku wî bi "Olaf Palme", "Bernard Kouchner", bi "Bruno Kreisky" û hwd re... danîbû, kûr û bê mînak bû. Di sala 1990'ê de, piştî şehîdbûna wî, ji aliyê navdarên Komara Çekoslovakya û Nemsa – Avusturya – bû berendamê Xelata Nobel ya Aşitiyê.

Di sala 1968'an de, Rehman vekirî û bi dengekî bilind piştgirtiya însiyatîva reforman li welatê me ku xwe wek Bihara Piragê da nasîn, kir. Di wan rojên dijwar yên dîrokî de ew digel gelê me, gelê Çek de li hember armancên koloniyalîstiya Sovyetê derket. Ew bi me re bi gelê Çek re ket nava tekoşînê bona demokrasiyê, ji bo sosyalîzmekî bi rûyê mirovatiyê ne bi zordarî. Piştî ku Bihara Pragê bi tankên rejîma zordar ya Sovyet û yên din, bi sed hezaran leşkerên biyanî hat perçiqandin, em tev ji kar hatin avêtin, em bi şev û roj ketin bin kontrola polîsên rejîma zilimkar. Em Çekî bûn, nikaribûn me ji vî welatî bavêjin, lê Rehman wek biyaniyek hate hesibandin û ew û malbata wî ji Çekoslovakya bi zorê derxistin. Di sala 1973'an de bû serokê PDKÎ û di kongeryên din de jî heta dema şehîdbûna wî timî ew wekî rêberê partiyê hilbijartin. Rehman piştî ku ji Çekoslovakyayê hate derxistin, navenda tekoşîna xwe bo gelê Kurd kişand û bir Parîsê û li wî bajarî dengê gelê xwe digehand çar aliyê dinê. Tekoşîna wî ji bo mafên demokratîk yên gelê Kurd û rakirina sînoran ku hebûna gelê Kurd û Kurdistan 4 perçe kiribûn, ev yek, yek ji mezintirîn neheqî û sûçên sedsala 20'an ya hember mirovatiyê ye. Wî li hember vê neheqiyê tekoşîna xwe dimeşand. Wî realîteya sedsala 20'an baş nas dikir û dizanibû ku ji bo gihîştina wê armancê pêwîst e Kurdistana Îranê Otunomiya xwe bistîne û Îran bibe demokratîk, ji bona vê yekê jî durûşma wî "demokrasî bo Îranê û Otonomî ji bo Kurdistanê" bû. Bona gihîştin bi vê armancê, li kêleka şerê çekdarî, timî li riyên dîplomasiya navnetewî digeriya û diceriband. Ji her aliyekê ve hurmet jê re nîşan didan û guh didan dengê wî. Di warê dîplomasiyê de wek hostayê bê hempa yê kompromîsan dihat naskirin. Kêm kesan wekî Rehman dikarî du aliyên dijmin bîne ba hev û bi wan biryarekî adil bona herdu aliyan bide stendin. Rastiya her aliyan qebûl dikir, lê rê ji wan re nîşan dida ka çawa mirov û alî bi rastiyên xwe re dikarin werin ba hev û rastiyekî hevbeş peyda bikin û ji wê rastiya hevbeş re xwedî derkevin û biparêzin. Di vê warê de Rehman hostayê vê senetê bû.

Di dawiya salên 80 yên sedsala bihurî de, ji rejîma Îranê re jî wek hostakî bê mînak yê dîplomasiyê, kompromîsek ji bo aştiyê pêşniyar kir. Wî hêvî dikir ku bi wan re ji kompromîsekî medenî dibe ku mimkin be. Lê bîr ji ne vê yeke kir ku kesên hember ên wî hov û nemirov in. Bihaya vê xweşniyetiya xwe bi jiyana xwe û bi jiyana du hogirên xwe re da…

Roja 13.07.1989'an li Viyenayê bi du hogirên xwe re bi destên zalim û xwînxarên rejîma Îranê re hat şehîdkirin. Bikujên wî mêrxasê bê hempa heta îro jî nehatine cezakirinê. Ev bûyer di dilê Ewropa navîn de, qewimî, di dilê dost û hevalên Rehman de birînekî kûr e. Di kolanên Parîsê de bi hezaran kes ji çar aliyên Ewropa bi wî re çûn goristana Şehîdan ya "Pere Lachaise". Ev trajedî mixabin car din di Berlînê de bi şehîdkirina Dr. Sadiq Şerefkendî xwe dubare kir.

Cara dawî ez û Rehman di destpêka sala 1989'an de hatin ba hev, çend roj piştî sersaliya wî, 59 salî (22.12.1930) û di wan rojan de ez jî bibûm 60 salî û me bi hev re hem sersaliya wî û hem jî ya min pîroz kir. Me biryar stenbibû ku di wê salê de emê car din li Pragê hevûdin bibînin, ji ber ku me tev de êdî dizanibû ku di sala 1989'an de emê şoreşa xwe di Çekoslovakyayê de bibin serî û em dê Rehman bi fermî dawet bikin û heta ji destê me were em dê îmkanên Komara Çek ji wî re pêşkêş bikin, ji wî dost û tekoşerê gelê Çekê re. Di destpêka meha 7'an ya sala 1989'an de ji min re ji Viyenayê telefon kir û got ku ew dê bi karbidestên hikûmeta Îranê re were ba hev û piştî wê hevdîtinê derbasî Parîsê nabe û venagere wir, belku dê were Pragê û mizgîniyek xweş bîne. Ciyê mizgîniya wî, ew xeberê bixwîn gihîşt min û hebûna min, ya malbata min û hemû dost û hogirên wî lerizand.

Bo min, ji bo malbata min û dostên me serbilindî û şeref e ku em bûn dostên Rehman, ew têkoşerê bê hempa yê demokrasî û azadiyê û şervanê dijî terorîzmê.

Em serbilind in ku ji Rehman re welatê me bûbû welatê wî yê duyemîn ku di her firsendekê de vegeriya, dihat bo dîtina me.

Ew di welatê me de, di dilê me de hertim sembola mêrxasî, rastî û dilsoziyê bû û wusa jî dê bimîne.

Em neviyên xwe bi çîrokên wî mêrxasê bê hempa re mezin dikin, dê di warê me de her hebe.

*** Profesor Karel Jech, destekî herî nêzîk û qedîmî yê kurd û Şehîd Dr. Qasimlo ye. Sala 1928'an li Çekoslovakyayê hatiye dinê. Pisporê dîroka aboriyê ye. Di dema xwendini zanîngehê de, 5 salan bi Dr. Qasimlo re di yek ode û zanîngehê de bûye. Heval, dostekî herî nêzîk yê wî bûye. Çendîn xelatên zanistî di warê pisporiya xwe de wergirtine. Çend pirtûkên zanistî ili ser şaşiyên di reformên aboriya sosyalîstî de nivîsandine. Prof. Karel sala 2008'an bilindtirîn xelata zanistî ya komara Çekê wergirt. Babê 3 zarok û kalê neviyan e.**

## Doma gotara Komara diz û derewînan, ji rûpela 3'an

siyasî neke. Lê ji ber cewhera xwe ya muhafizekar, dezgeha dadweriya welat di piratîkê de bûye dijberê herî xurt yê guhertinan. Bi dehan rojnamevan û siyasetvanên guhertinxwaz, bi fermana hêza dadweriyê û ji ber ramana siyasî hatine girtin, îşkencedan û îdamkirin. Rê ji weşandina gellek govar û rojnameyên guhertinxwaz re hatiye girtin û hemû dengê azadîxwaz li Îranê bi destûra wê hêzê tên serkutkirin.

5. **Medyaya dewletî** ku bi eşkere li dijî hemû guhertinan, daxwaziya vekirin û rêbaza nûjenxwaz disekine. Dezgehên radiyo, TV û piraniya rojnameyên mezin li welat bûne alevê destê muhafizekaran ji bo belavkirina propagendeya li dijî guhertinan. Helwêsta medya Îranê li dema hilbijartina serokkomar û piştîvaniya TV-yên dewletî li Ehmedînijad, medya Komara Îslamî kirine mekîneya herî xurt ya propagendeya paşverûtî û dijî demokrasiyê. Ji ber ku Radiyo û TV dewletî ne, êdî tu îmkan di dest kesayetî û aliyên guhertinxwaz li navxweyê Îranê namînin ku dengê xwe bigehînin civakê.
6. **Hêzên çekdar** yên Sipahê Pasdaran û grûpên paramîlîteryên weke Besîc ku girêdayiyê serokê olî ne. Li her ciyê ku civîn, semînar an mitîngên siyasî ji bo bas li ser guhertinan têne organîzekirin, ew grûpên çekdar ji bo kontrolê tîmên taybet dişînin. Pirr caran karê wan li gor fermana rasterast ya serokê olî dimeşe ku li gor yasayê berpirsiyarê herî bilind yê hêzên çekdar e.

Hêzên çekadar, di pêvajoya dubare hilbijartina Ehmedînijad de xwedî rola sereke bûn. Ew her wisa weke şûrê Demoklês, her tim li hindavî serê rexnegirên sîstemê sekinîne. Her dema gotinek ne li gor xwesteka sîstemê ji devê kesekê hate der, êdî her Pasdar an Besîciyek bi xwe dibe dozger û hakim û biryarê dide ku çi bîne serê mirovan. Rêjîm bi riya wan dezgehan, hem dikare zexta giştî li ser civakê xurt bike û hem jî zêhniyetek hişk û ji guhertina re girtî, biparêze.

Zêhniyeta desthilatar, her çend kêm be jî, lê bi riya mekanîzmên kontrol û tundûtûjiyê dikare tesîrê (karîgeriyê) li ser kapasîteya sîstemê ji bo guhertinan danê. Lewma, dema hêz an aliyek guhertinxwaz serî hilde, nikare di çarçoveya sîstemê de mikanîzmekê ji bo guhertinê peyda bike.

Projeya ku berî 11 salan, serokkomarê demê, Muhemed Xatemî bi nav ji bo guhertinên siyasî ragehandibû û niha bi hêviya Mîr Husên Mûsewî qirar bû bê meşandin, her çend piştgiriya civakî hebû, lê dubare hate astengkirin. û piştî pêvajoya hilbijartinê, niha hewl tê dan ku bi yekcarî bê fetisandin. Lê encama ku ji wê rewşê derkeve çi be, dê pêşeroja Îranê ji salên derbasbûyî pirr cudatir be…

www.arsivakurd.org

# Daxuyaniya Desteya Rêveber Ya Rêzgirtin Ji Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Di Bîstemîn Salvegera Şehîdkirina Wî De



**Agirî -** Bi hilkevta bîstemîn salvegera terorkirina rêberê navdar yê Kurd, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hevalê wî Ebdula Qadirî Azer, bi destê terorîstên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve, Desteya Rêveber ya rêzgirtin ji Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo û hevalên wî, daxuyaniyek çapemeniyê belav kiriye û tê de daxwaz ji xelkê Kurd li Kurdistana Îranê kiriye ku bi berçavgirtina 7 xalan, gireveke giştî a nerazîbûnê lidar bixin.

Di destpêka wê daxuyaniyê de hatiye: “20 salan berî niha û di Pûşpera sala 1368’an a Rojî (Tîrmeha 1989)’an, rêberê mezin û navdar yê Kurd û Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Dr. Ebdulrehman Qasimlo, bi armanca çareserkirina aştîxwazane a doza rewa ya Kurd li Îranê gihîşte Viyen, paytexta Otrîşê taku digel nûnerên Komara Îslamî gotûbêjê bike, bi wê hêviyê ku Komara Îslamî a Îranê dest ji siyaseta xwe a kurdkuştinê berde û pirsa neteweya 10 milyonî a Kurd li Îranê ji rêya gotûbêjê ve were çareserkirin. Lê mixabin roja 13.07.1989’an de, bersiva pêxemberê aştî û mamostayê demokrasiyê bi guleyan hate dayîn û tevî Kekê Ebdula Qadirî Azer, endamê Komîteya Navendî û Nûnerê PDKÎ li derveyî welat, di xwînê de hate sorkirin û tevlî karwanê Şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê bû.”

Di doma vê daxuyaniyê de hatiye: “terorkirina necamêrane a rêberê navdar yê Kurd, Dr. E. Qasimlo li ser maseya gotûbêjê, redkirina bixwîn a peyama aştî û tebahiya wî rêberê mezin bi nûneriya gelê Kurd li Kurdistanê bû û ji wê demê vere heta niha, rejîma terorîstperwer a Komara Îslamî a Îranê, bona serkut û qirkirina civatên xelkê Kurdistanê, ji vê alava biyom a serkut û tunekirinê mifahê distîne û tu cure guhartineke erênî di siyasetên dijî gelî yên wê rejîma azadîkuj de nahê dîtin.

Lê serbarê wê hemû serkut û tundûtûjiyê, gelê Kurd li ser daxwazên rewa û berheq ên xwe biîrsrar û mikum e û weke Qasimlo dibêje: **“Gelek ku azadiyê bixwaze, divêt nirxa wê azadiyê jî bide”**.

Daxuynaiya Desteya Rêveber ya rêzgirtin ji bîstemîn salvegera terorkirina Dr. E. Qasimlo piştre destnîşan dike: “Di 20’emîn salroja terorkirina rêberê navdar yê Kurd, Dr. E. Qasimlo de, bila em hemû bi hev re siyaseta teror û reşekujî ya wê rejîmê li bîr û raya giştî a xelkê Îran û cîhanê mehkûm û şermezar bikin û hem bi bi kurdkujan biselimînin ku hêvî û armncên Qasimloyê rêber, hêvî û armancên bi milyon Kurdên bêparkirî ji mafê wan yê neteweyî ye û neteweya me heta bicîhatina armancên Qasimlo dest ji xebatê ber nade”.

Desteya Rêveber ya rêzgirtin ji rêberê navdar yê gelê Kurd, Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo, di bîstemîn sala şehîdkirina wî de daxwazê ji xelkê Kurd li Kurdistana Îranê dike:

1. Hemû dikan û bazarên bajar û bajarokên Kurdistanê girê bidin.
2. Hevwelatî çirayên malên xwe bo 3 deqîqeyan ji seet 22’ê şeva 22’ê Pûşperê, bi dema Tehranê bitemirînin.
3. Hildana ala sê reng a Kurdistanê
4. Hilkirina ala şîn a bi rengê esmanî û mifahwergirtin ji wî rengî di awayên cur bi cur de.
5. Akinciyên gundan ji hatin û çûn bo bajaran di roja 22’ê Pûşperê de xwe biparêzin.
6. Hatin bo ser rê û şeqam û cihên giştî di piştînîvroya roja 10’ê Pûşperê de bi xeml û cil û bergên Kurdî.
7. Li her bajarek Kurdistanê, şeqam yan qadeke bajar bi navê şeqam û meydana **Dr. Qasimlo** bihê binavkirin.

Hêjayî gotinê ye ku navê şeqam û qadên hemû bajarên Rojhilatê Kurdistanê ji Makû heta Îlamê ku bi navê **Şeqam yan Qada Dr. Qasimlo** hatine binavkirin, di vê daxuyaniyê de ketiye ber çavê xelkê Kurdistanê.

Di dawiya daxuyaniya han de hatiye: “Bila em hemû bi meşandin û rêvebirina van heft xalane ku me yê xistiye ber çavê we rêzdaran, rêz û hurmetê ji xebat û têkoşîna rêberê me yê mezin, Dr. E. Qasimlo bigrin û tevî mehkûmkirina terorkirina wî mirovê zana û mezin, li ser armancên neteweyî û demokratîk ên rêberê me yê navdar, Dr. Qasimlo ku armanc û hêviyên bi milyon Kurdên bêpar ji mafên wan in, tekezê bikin û bi neyarên neteweya me biselimînin ku rêbaza Qasimlo, rêbaza xelkê mafxwaz yê Kurdistanê ye.

**Desteya Rêveber Ya Rêzgirtin Ji Bibîranîna Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo Di Bîstemîn Salvegera Şehîdkirina Wî De**

**Mafê Mirovan**



**Nivîsîn: Peter R. Baehr**
**Wergeran: Mecîd Heqî**

# Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Ger kesek bixwazibe cure pêwendiyeke lojîkî (mentiqî) di navbera peymanên mafên mirovan de desaz bike, armanca wê diviya peydakirina pêwendiyek *erênî (pozîtîv)* be. Bo mînak bidestveanîna mafê heqdestê dadperwerane û mafê karê tenahî û saxlemî dikaribe gellek caran girêdayî bi mafê xwe rêxistin û civînan ve hebe û ewa jî yanî mafê endametî li sendîkayên kedkarî. Mafê dengdanên azad û nihênî dikaribe alîkariya pêşveçûna rewşa jiyana xelkê li wan welatan bike yên ku desthilata wan ji aliyê dîktator birêve diçe û genedeliya siyasî – abûrî hakim e. Armanca peymanên mafên mirovan parastina endamên civakê yên bêhêz (zeîf), mafên cudabîran yên ku li hemberî dewletan radiwestin. Tu hegerek lojîkî nîne ku çima ew mafane bo civakên ne-rojavayî nabe.


Mînakek baş li dîbata cîhanîbûna mafên mirovan li Endonîzyayê hatiye nîşandan. Dewleta Endonîzyayê îdea dike ku derbarê mafên mirovan Endonîziya xwedî hinek nirxên taybetî yo ku digel standardên cîhanî yên mafên mirovan cuda ne. Lê belê “Adnan Buyung Nasution” di têza doktoraya xwe de nîşan daye ku pêvajoyên destpêkî yên mafên mirovan ji aliyê Perlemana Neteweyî ya Endonîzyayê ve ku bi awayekî demokratîk hatibû hilbijarin, di dehsala 1950’an de destûrek nû ji bo Endonîzya amade dikir, lê parleman ji aliyê serokkomar “Sukarno” ve hate hilweşandin. Adnan nîşan dide ku têgihîştina niha ya Endonîziya li mafên mirovan ew e ya ku nirxên mafên mirovan li welatên rojava ne jî û Endonîzya normên taybetî yên xwe ên mafên mirovan hene, ku li felsefeya dewletî ya *Pancasila (*ideolojiya dewleta hakim). Lê behsên perlemanê tiştên berevajî wê yekê nîşan didin:

Perleman bêy ku navê wê bîne, rêzê ji bo naveroka peymanên cîhanî yên mafên mirovan datîne, wek mafek xwezayî yê mirovan ku diviya li hemû şaristaniyên mirovanî bên rêzgirtin. Bawerî ewa bû ku ger mafên mirovan bê haşakirin, wê demê mirov mirovaniya xwe dê ji dest bide. Parastina mafên mirovan wek armanca dewletê hatibû berçavgirtin: Dewlet ji bo mirovan hatibû hizirkirin, nek mirov bo dewletan. Desttêwerdana bi zor ya serokkomar “Sukarno” Parleman daxist û bû hegera rawestana nîqaşên serbest derbarê naveroka peymana cîhanî ya mafên mirovan. Di bin desthilata serok komar Suharto de ku di sala 1986’an de, desthilata Sukarno herifand, mafên mirovan bi awayekî sîstematîk hatiye binpêkirin. Dewlata wî jî dixwaze axavtinên vala derbarê mafên cîhanî yê mirovan bike.

Bûyerên Endonîziyayê mînakek e ku di gellek cihên din ên cîhanê de ji dijî mafên mirovan tê encamdan. Pesendkirina cîhanîbûna mafên mirovan ramanek e ku dewletên dîktator wan li dijî xwe dizanin. Lê ew mafane ji aliyê qurbaniyên wan dewletane ve hatiye pêşwazîkirin.

www.arsivakurd.org

# Jinên Îranê, Dînamîzma Sereke ya xebat Û Berxwedan Aştîxwazane



Çinûr Qadirî

Piştî ragihandina encamên dewra dehem a hilbijartinên Serok Komariya rejîma Wilayeta Feqîh di bervara 13.06.2009’an de, pêlek berfireh û mezin a nerazîbûna xelkê li hember sextekariyên rejîma Wilayeta Feqîh di encama hilbijartinan de, li pirraniya bajarên Îranê nemaze li Tehranê dest pê kir.

Serhildanên vê dawiyê ên xelkê nerazî ji rejîma Îslamî a Îranê, ji aliyekê peykerê sîstema Wilayeta Feqîh bi xurtî hejand û ji aliyekî din ve ji bo bizava mafxwazane û demokratîk a xelkê Îranê bi awayê xebata sivîl û aştîxwazane, serkevtinek mezin bû. Lê vê carê jî weke edetên her car, xwestek û daxwazên xelkê Îranê yên bi awayên sivîl û aştîxwazane, bi serkutkirin, kuştin û girtinê bersiv hate dan, bi awayekê ku heya niha bi sedan kes di serhildanên wê dawiyê de bûne gorî.

Piştî ragihandina encama hilbijartinan, balkêştirîn dîmenên nerazîbûnên seranserî li Îranê, him di warê çawaniyê de û him jî di warê çendatiyê de, beşdariya berçav a jinan di wan xwenîşandanane de bû. Jinên nerazî ji sîstema Wilayeta Feqîh û yasayên kevneşop û nedemokratîk ên dijî jin yên Komara Îslamî a Îranê û yasayên dijberî wekheviya civakî û regezî, bi beşdariya berfireh a xwe di wan xwenîşandanên sivîl de, giraniya xwe weke çîna bibandor a civaka Îranê nîşan dan û weke nîviya civaka Îranê, bersiveke rohn û “NA”yekî mazin gotin rejîma Îslamî a Îranê ku li gor yasayên wê rejîmê, jin divêt di çarçoveya mal û malbatê de bimîne û



beşdarî tu liv û tevgereke civakê nebe. Lê beşdariya jinan û keçên xwendekar bi awayekî netirsane di xwenîşandanên nerazîbûnê de li kêleka mêr û xortên nerazî ji sîstema Wilayeta Feqîh, bala bîr û hizra hundir û navneteweyî bo aliyê xwe rakişand û nigeraniyeke mezin ji bo rayedarên Komara Îslamî a Îranê pêk anî. Ji ber vê yekê jî di destpêka xwenîşandanên sivîl de, hêzên Ewlekarî, Besîc, hêzên bi cilûbergên şexsî û Sipaha Pasdaran, êrîş kirin ser xwenîşanderan û bi awayekî hovane dest dane serkutkirina xelkê nerazî û heya niha bi sedan kes hatine kuştin û birîndarkirin û bi hezaran kes jî hatine binçavkirin. Bi taybetî piştî dîmena şehîdkirina bêrehmane a keça xwendekar a beşdar di xwenîşandanên roja şemî, 20’ê Hezîrana 2009’an de, “Nida Axa Sultan”, ji aliyê hêzên Besîc ên rejîmê ve, ku dengvedaneke cîhanî hebû, bû sembola serhildanên wê dawiyê ên Îranê.

Bizava wekhevîxwazî û mafxwaziya jinan li Îranê niha yek ji çalaktirîn û bibandortirîn bizava civakî di meydana siyasî, civakî û çalakiyên sivîl ên Îranê de ye, lê serbarê arîşe û pirsgirêkên ku rejîma Îslamî a Îranê tîne ser rêya vê bizavê û zext û givaşên sîstematîk ên rejîmê li ser xebatkar û kesayetî û rêxistinên sivîl ên bizava jinan, berevajî xwest û çavnihêriyên rayedarên Komara Îslamî a Îranê, ji vê derfetê mifah standin û hêz û şiyana bi bandor a xwe nîşan dan û selimandin ku ew weke nîviya nufûsa civakê, li hember hemû bûyerên siyasî ên welat, xwe bi berpirsiyar dizanin û amade ne ku her cure rolekê bilîzin û tu demekê naxwazin siyaseta newekheviya li dijî jinan û berteskkirin di warê kar û çalakiya jinan de li çarçoveya mal û malbatê, qebûl bikin. 3 sal tepeserkirin, newekheviya zayendî û zalkirina sîstema mêrserdestî, hesibandina jinan weke hevwelatiyên derece çend, sepandina yasayên paremayî û siyasetên sîstematîk ên dûrkirina jinan di warên giştî ên civaka Îranê de û ..., encameke nerênî ji bo Komara Îslamî a Îranê hebû û weke tê dîtin jinên hişyar û azadîxwaz ên Îranê, li hember wê rewşê teslîm nebûne û nabin. Jinên Îranê her dem di refa pêş a hewildan û xebat ji bo pêkanîna wekhevî û cîgirkirina demokrasiyê de bûne, destpêka wê xebatê 3 heftiyan piştî hatineserkara rejîma Xomeynî, xwe nîşan da ku tê de jinên Îranê bi sedema sepandina lixwekirina bizor ya Îslamî ji aliyê rejîma Îslamî a Îranê ve, xwenîşandanên ber fireh yên nerazîbûnê birêve birin. Rêberên rejîma Îslamî a Îranê divêt ku her wê demê têgihîştibin ku siyasetên paşverû li hember jinên azad û şiyar ên Îranê dê bêencam bin.

Biwêrî û netirsiya jinên beşdar di xwenîşandanên wê dawiyê ên Îranê de, bi radeyekê berçav bû ku wan li hember kamêrayan, ser û çavên xwe nedipeçavtin û bi hawar û bangewaza bilind a xwe, êş, kul û derdên dilê xwe û meynetiyên xwe li hember desthilata dîktator û tepeserker a Wilayeta Feqîh, betal kirin. Di pirraniya wan cihan de ku xwenîşandanên nerazîbûnê birêve çûn, eger jin pirraniya xelkê nebûbin, aliyê kêm nîviya xelkê xwenîşander pêk dianîn û hemasyeke dîrokî afirandin û bêguman dê zêdetir jî biafirînin û tirsa di dilê rejîma dîktator zêdetir û xurttir bikin.

Jinên Îranê weke dînamîzma sereke a xebat û berxwedan li hember zulm, tepeserî û dîktatoriyê, hatine meydana tekoşîna demokrasîxwazî û mîna nîva nufûsa civakê, di pêxema tunekirina îdeolojiya Wilayeta Feqîh û ji holêrakirina newekhevî û bêedaletiyê û cîgirkirina demokrasî û azadiyên demokratîk di pêşeroja siyasî a Îranê de, faktereke bihêz û bibandor in.



www.arsivakurd.org

# Berpirsên Komara Îslamî Rê Nadin Rê Û Resma Rêzgirtin Ji Goriyên Kîmyabarana Serdeştê Birêve Here

Komek ji çalakên sivîl ên bajarê Serdeştê bi hinceta 22hemîn salvegera karesata kîmyabarankirina bajarê Serdeştê, daxuyaniyeke rexnegirane der kirin.

Naveroka daxuyaniya han bi vî awayî ye: “22 salan berî niha rejîma Bees a Îraqê, bajarê Serdeştê kîmyabaran kir û di wê cinayeta dijîmirovî de zêdetirî 100 kes ji xelkê bêsûç û hevwelatiyên sivîl ên vî bajarî hatin kuştin û bi hezaran kes jî birîndar bûn, bi wayekê ku piştî derbasbûna 22 salan, hêj bandora vê karesatê li ser xelkê Serdeşt û derdorê diyar e”.

Di daxuyaniya wan çalakên sivîl de serbarê îşarekirin bi yasaya qedexebûna mifahwergirtin ji çekên kîmyayî û biyolijîkî, hatiye: “Piştî derbazbûna 22 salan ji wê karesatê, derheq pêdeçûna huqûqî, li Dadgehên Navneteweyî hewleke wiha nehatiye dan û her wiha ji bo qerebûkirina ziyanên madî daringî û meenewî yên wê karesatê, hewil nehatiye dan”.

Di beşeke din a daxuyaniyê dehatiye: “Berpirsên organên dewletî bi xemsarî ji çavnihêrîkirin û pêşîgirtin ji çalakiya rêxistinên sivîl û kesayetiyên bawerpêkirî ên xelkê Serdeştê, derfeta birêveçûna her cure rêzgirtinekê ji goriyan girtiye”. Her wiha di beşeke din a daxuyaniyê de îşare bi xemsariya çalakên sivîl û civatên nedewletî û xemsariya taqimên cur bi cur ên xelkê Serdeştê di vê derbarê de hatiye kirin.

Çalakên sivîl ên bajarê Serdeştê ragihandine ku “Em komek ji paşmayî û goriyên karesata kîmyabaranê Serdeştê û çalakên Sivîl, serbarê mehkûmkirina wê karesatê û rêzgirtin ji xwîna şehîdan û her



wiha hêviya aştiya bi ewle û cîhaneke dûr ji çekên mîkrolojî û komkujiyî, daxwazê ji berpirsên têkildar li hember wan xwestekane dikin ku di vê derbarê de hewlê bidin û bala xelkê cîhanê bo aliyê wan rabikişînin.

# Hejmara Cudabûnê Li Parêzgeha Kurdistan A Rojhilatê Kurdistanê Jorde Çûye

Hejmara cudabûnê li parêzgeha Kurdistanê a Rojhilatê Kurdistanê jorde çûye, bi awayekê ku sala borî di warê berdanê de, parêzgeha Kurdistan li Îranê xwediyê pileya duyem bûye.

Li gor rapora Nûçegihaniya Komara Îslamî a Îranê(IRNA)’yê, Serheng Îbrahîm Kazimînijad, Cîgirê Civakî yê hêzên Întizamî ên parêzgeha Kurdistanê, roja duşem, 29’ê Hezîrana 2009’an, di yekem civîna karê girûpa jin û malbatên parêzgeha Kurdistanê de serbarê ragihandina vê nûçeyê got: “Hejmara cudabûnê di sala borî de %15/15 bûye ku li hember sala pêştir de %1/30 zêdetir bûye.

Navhatî her wiha got ku zêdetirîn radeya berdanê di sala borî de, li bajarê Sine, %22/41 û kêmtirîn rade jî li bajarê Dîwandere, %9/24 bûye.

Serheng Îbrahîm Kazimînijad tevî îşarekirin bi lêkolînan, sedema jordeçûna hejmara ji her veqetiyana jin û mêran li parêzgeha Kurdistanê, pêkanîna jiyana hevbeş bi awayeê şaş, amadenebûn ji bo pêkanîna jiyana hevbeş, xemsarî li hember têgihîştina cendekî û seksî û aborî û li hemûyan girîngtir balnedan bi soz û evîndariyê da zanîn.

Navhatî di beşeke din a axavtina xwe de got: “Hejmara cudabûnê di sala borî de li bajarên Seqiz, Bane û Merîwanê, bi rêz %17, %14/74 û %13/94 bûye ku li hember sala borî kêmtir nîşan dide, lê li bajarên Qurwe %11/7, Bîcar %11/8 û Dîwandere %9/34 bûye ku li hember sala pêştir zêdetir bûye.

Îbrahîm Kazimînijad her wiha hejmara xwekujiyê li parêzgeha Kurdistanê bi ziyanên civakî ên din hesiband û got: “Li parêzgeha Kurdistanê li gor rewşa welat û berevajî navgîniya cîhanê, hejmara ew jinên ku xwe dikujin, li mêran zêdetir e.



# Xwendekarê Kurd kiyanûş Asa Li Kirmaşanê hate bibîranîn

Roja sêşem, 30’ê Hezîrana 2009’an, rê û resma sersaxiya Kiyanûş Asa, xwendekarê têrma dawî a Karnasiya Bilind a rişteya Petroşomî ’yê, birêve çû.

Navhatî di bûyerên vê dawiyê yên yek ji meşên nerazîbûnê derheq encama hilbijartinan, roja 15’ê Hezîrana 2009’an, ji aliyê hêzên xwedî cilûbergên rejîma Îslamî a Îranê ve hate kuştin.

Li gor nûçeya RMMK’ê, di vê rê û resmê de pitir ji 6 hezar kesan ku pêk hatibûn ji endamên malbata wî, xizm û kes û karên wî, kesayetiyên siyasî, mirovhez, mamostayên zanîngehê û hejmarek zaf ji xwendekaran, beşdar bûn.




# Li Bajarê Xoyê 4 Kasibkar Hatin Kuştin Û Birîndarkirin


Roja sêşem, 30ê Hezîrana 2009an, komek ji kasibkarên gundê **Yartaxlî** ser bi devera Elenda bajarê Xoyê, ketin ber êrîşa guleyên hêzên rejîma Îslamî a Îranê.

Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de da zanîn ku di encama êrîşa han de kesek bi navê Eskender Mihemedî hate kuştin û 3 kesên din bi xurtî birîndar bûn.

Hêjayî gotinê ye ku yek ji birîndaran xelkê gundê Belesûrê ye.



# PERWEDEHİYA ZANISTÎ



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Mirov, bi saya perwerdehiyê gellek derfet û serkeftinên girîng bi dest xistine. Pîşe û xebatên ku mirov bi saya perwerdehiyê bi dest xistine jî, mirov gellek caran ji hêla derûnî û jîrayî ve têr dike û ber bi aramiyê ve dibe. Derfetên ku vê yekê pêk tînin, bidestxistina tehmijandin û şanaziyên ku jiyana mirov bextewar dikin, pêkan û hêsan dike.

Perwerdehiyeke baş, standarda jiyanê bilindtir û behreyên mirov ên ku bûyer û rastîniyên jiyanê baş rave dike, mikûmtir dike. Perwerdehiyeke baş, rastîniya navbera bûyeran, dîtina têkilî û girêdan û rêgezan bi dest dixe. Perwerdehî, derfeta arastebûna afirînerî, hilberîneriya ramîn û hizirîna mirov jî pêk tîne. Fikrên qalibgirtî û neguherbar ên ku di mêjiyê mirov de hatine bicihkirin, ji holê radike.

Cihê ku perwerdehiyeke zanistî lê tunebe, dê mirov qîma xwe bi nezanî û xeşîmiya xwe bîne û dê hemû cehd û behreyên xwe di riya tiştên nebaş de serf bike û bi kar bîne. Ev tiştekî bi ser re ye. Jiholêrakirina tiştên bêkêr û bêrê, ancax bi perwerdehiyê û xwendineke birêk û pêk, pêk tê. Zanîn, pêkanîna afirandina ku cudayetiyê diafirîne ye.

Heta ku di bizavên mirov de veguhertin pêk neyên û mirov jidil û can tiştekî neke tu sûda rêbaz, zagon û qedexeyên demdemî nîn e. Nemaze pergal û rêveberiya ku nikaribe mirovan perwerde bike her gav serî li rêbazên çewsîner, astengî û qedexeyên tund dide. Mirovan bi darê zorê di bin nîrê zilmê de diperçiqîne. Pergala despot, mirovên despot û kesên ku tev dişibine hev digihîne. Kesayetî, fikr û ramana mirovan li gora vê pergalê dirûv digirin. Mirov wekî alavên hilberiyê, ji bo berjewendiyên çend kesên hêzdar û çîna desthilatdar têne xebitandin. Mirovên perwerdekar û perwerdebûyî xwe wekî endamê civakê dibînin. Ji ber vê yekê, ew her gav xwe ji her tiştî neyinî berpirsiyar û ji bo her tiştî erênî jî peywirdar dihesibînin. Wes Izzard dibêje : "Hûn ji bo guherandina bapîrên xwe nikarin tiştekî bikin; belê ji bo neviyên xwe dikarin pirr tiştan bikin." Rast e. Her mirov dikare ji bo dahatûya civakê, dema bê, nifşê nû û her wiha zarok û neviyên xwe gellek tiştan bike. Belê beriya her tiştî divê mirov ji bo vê dilxwaz û dilsoz be.

Mirovên ku li gorî azîneyên hêvotina zanistî têne perwerdekirin, tu carî hewceyî qelpîtî û serşûriyan nabin. Di perwerdehiya zanistî de lasakerî/teqlîdkarî nîn e. Û hewce nîn e ku tu kes xwe bişibîne kesekî/e din. Lewre her mirov dikare bi rengê xwe, bi dengê xwe, derkeve qada jiyanê û hest û hizrên xwe derbibîre. Ango kesên ku di vê perwerdehiyê re derbas dibin, tenê dişibine xwe. Ya rast, kesayetiya takekes û xisletên mirov ên resen û xweser jî her gav bi vî awayî pêk tên.

Pergala perwerdehiya zanistî, naşibe pergala perwerdehiya dûgelên paşverû û civakên paşmayî. Îro li gellek deverên dinê pergal û şêwaza perwerdehiya gellek welatan dûrî rêbaz û azîneyên zansitê ye. Perwerdehiya dûgelên kevneperest, ji bo ku tevê hemwelatiyên xwe bişibine hevdû, hemûyan di hundirê şablonekê de didewisîne. Wan wekî robotên bêvîn û bêgiyan digîne. Û wan di nava diranê wê pergalê de diesirîne.

Perwerdehiya zanistî bervajî wê; netewe, nîjad, ol, ziman, çand, rewşa aborî û her wekî din dab û nêrîtên mirovan li ber çavan digire. Mirovan li gorî van peytandinan perwerde dike û digihîne.

**Kaniya Helbestan**

## Dayê



Hejarê Kurd

Dayika dilovanê
ji te dûrim dinav
dilovaniya teda radibim
û rûdinim, diçim û têm
lê carne di hişkeftên
nexwiyayî hildiweşim
û carne dengê awazê
xapînok Evîna min
didizin .
Dayê
Lê gava ji nav bêna
Her dû lêvên teyên
Şîrîn ku tîrêjên ken je
Diherikîn rohnîdikirin
Ezmanê dilê me û em
Dixistin buhişta cîhanê,
Ü me bi perîyên
mehrebanîra tîpên evînê
li ser lêvên te dixwendin
Dayê
Lê îroj dinav herdu lêvên
teda deryayeke bi sire, bi
Mije, bi dûmane, ne xûyaye,
Ne zelale.
Ew tîpên evîna te
hebûna te ketine nav
Lepên bênemaz û,
nenasane û bi hovîtî
vedçrînin.
.Dayê
lê qîrîna rastiya te
durustiya te hebûna te
bawerîye.
-di dilê mêrxwazanda
-di dilê comerdan da
bûye benda hebûn û
tinebûnê ye.
dest nimêja xwe bi Evîna
bi Evîna te dikin
sond bi te xwarine
govenda mêraniyê girtine
sirûdên hey reqîb dibêjin
-tu carî tu namirî
-tu carî tu nakevî
ger bi zûbî ger dereng bî
wê kenê te yê dilovanî
dîsa vegerê ser lêvê te
jîn bibe û qet namire
Dayîka Zeredeşt.

www.arsivakurdi.org

# Navenda Çandî, edebî û hunerî ya “Wêjan” hate avakirin

**Di çend rojên borî de, navendeke nû ya çandî, edebî û hunerî bi navê Wêjan kete nav qada xebata rewşenbîriya Kurdî û bi daxuyaniyeke çapemeniyê, bi awayekî fermî dest bi xebatên xwe ên hunerî, wêjeyî û çandî kir.**

**Hûn dikarin li ser malpera înternetî a vê Navendê, agahiyên berfireh li ser xebat û armancên vê navendê bixwînin: www.wejan.org**

**Deqa daxuyaniya avabûna Navenda Wêjanê ku hebek ji Agirî re ji hatiye şandin ev e:**




Rewşa siyasî ya Kurdistanê ji ber Cografiya parvekirî ya siyasî û jeopolîtîk a dijwar, hertim di rewşekî nexweş û ne bi dil de bûye. Di dirêjahiya çend sedsalan de rewşa han her dom hebûye û niha jî bi awayekê didome. Di peydakirina nasnameya neteweyî de, êrîşên bîhaniyan û bîr û hizrên wan hertim astengên rê bûne. Ji hev veqetiyana cografiyayî ya herêmên Kurdistanê ew kultûre di rewşeke par par û herêmî de hêlaye û nebûna jiyanekî hêmin a şaristanî û birokrosiya îdarî û ji hemûyan girîngtir nebûna dewletê, bûne sedema lawazbûna Ku tûreke hevbeş û yekgirtî.

Bi serhildana modernîtê û hilweşandina hizrên dunyaya kevin û mehandina dewletdariyê di dunyaya Rojava de dergehek vebû ku dikarî piloralîzma çandî qebûl bike û hizir û aqilê nûjen û pirsiyar çêker xwe di qeyd û benda metafizîkê de rizgar kir û sîstema dewletdariya kilasîk herifand.

Teknolojiya şer di destpêka sedsalên 20’an de, bi milyona kes dane kuştinê. Şerê îdeolojiyan bi hevkarî û hevpiştiya teknolojiya kuştinê gihîşte astê xwe yê herî bilind. Civaka kevneşopparêz û paremayî di Rojhilat û Rojhilata Navîn de her wek xwe man, lê nûjenbûn û modernazîsyon bi lezgînî ketne xizmeta hizir û aqilê paremayî û vê çendê jî dîktatorî û xweserî bilindî esmanan kir. Di welatên Îran, Turkiye, Îraq û Sûriyê de, asîmîlasiyon û kontirola çanda neteweyên bindest, nemaze neteweya kurd, pitir û xurtir dest pê bû. Hemû tawanên ku îdeolojiyên weke Panîranîzm, Panerebîzm û Panturkîzmê di pêxema axa pitir û efsaneyên zêdetir de kirine, belgeyên selimandina vê rastiyê ne. Xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd jî bilî wê çendê ku xebatekî siyasî – neteweyî bû, lê belê neçar bû ku di qada çandî de jî erkekî giran bigire stû. Ev yeka eyankerê bêrehmî û hovîtiya bê sînor a neyarên gelê Kurd e.

Neteweyên bindest û nemaze gelê kurd, di rewşeke wiha de neçar bûn ku li çar nikarên xwe çembereykê ji hesin çêbikin, di her cihekê de ku zext û jinavbirin hebe, çanda xwe diparêzin û hemû hewla wan jî ji bo man li ser esl û bingeha xwe bû. Wiha ye jî ku qet geşe nake, lê wenda jî nabe. Taybetmendiyên han netenê di gelê kurd de hene, belku her neteweyekê ku gefa asîmîlasiyanê li ser hebe, neçar e ku wiha bike.

Di serdemê Riza Şahê Pehlewî de bi çavlêkirinekê ji Ata Turk, xebat hate kirinê ku modela yek netewe, yek ziman û yek çandiyê were sepandin û ewa jî bi piştevaniya sîstemeke dîktator û milîtarîstî dimeşiya ku encamên vê pêvajoyê berevajî derketin. Li ser navê çandê dijî çand derketibû holê, ji ber ku rê dida çandekê ku bi piştevaniya efsaneya nejada Ariyayî û vexwendina dîroka xelitandî ya Îranê, ziman û çanda neteweyekê bimehîne, xwezayî ye ku hizrekê wiha tirajidiyan wiha jî jê çebin ku mixabin dîroka hevçerx a Kurdistanê gellek pişt guh ketiye. Di Komara Demokratîk a Kurdistanê de, ji bilî wê hindê ku biyaveke dilxwaz û zirûfeke baş di rewşa siyasî û çandî ya Kurdistanê de çêbibû, çand, ziman û wêjeya kurdî vejiya û pêlekî mezin a çand û ronakbîriya neteweyî dest pê bû û xwendingeheke dewlemend a çandî û wêjeyî hate avakirin ku heya niha jî bandor û encamên wê xuya ne. Wêjeya berxwedanê (nemaze helbest), piştî Komara Kurdistanê jî tevî xebata siyasî û neteweyî ya Kurdistanê her berdewam bûye û kariye ku xizmetekî birûmet bi çand, wêje û doza berheq a Kurd re bike û di haydan û hişiyariya neteweyî de roleke mezin hebûye. Her çend ku ziman û derbarîna edebiyata berxwedanê di qonaxên cuda de guheriye, ew pêvajoya derwest a edebî her berdewam bûye û di dirêjahiya xebata çandî ya gelê Kurd de bi awayekî çeleng derketiye meydanê û rola xwe ya girîng lîstiye ku niha jî hêj dewsa wê xuya ya.

Rewş bi hatina rejîma Komara Îslamî di Îranê de xirabtir bû, ji ber ku sîstema îdeolojîk a mesebî bû xaleka din a dubendiyê di navbera ol û mesebên cuda de. Çand û zimanê Kurdî di heyamê 30 sal temenê rejîma han de weke serdemên din ên bindestiya Kurdistanê, xwe parastiye û di her derfetekê de ku jê re çêbûye, xebat kiriye ku xwe bi pêş bixe. Demekê hucre û mizgeft navendên parastina wî çand û zimanî bûn û kesên hêja perwerde kirin ku niha jî di dîroka edeb û wêjeya Kurdî de cihê wan tê xuyakirin.

Wextekê jî avakirina civatên edebî di 30 salên borî de geşe û pêşkevtin dan çanda Kurdî ku niha jî li gor şiyana wan dewsa wan xuya ye. Di aliyê herî kêm a xebata xwe de, wan bi dehan û sedan kes hînî xwendin û nivîsandinê bi zimanê Kurdî kirine û helbestvan û nivîskarên hêja û camêr pêşkeşî civakê kirine.

Di sê dehsalên borî de anku di dehsalên 60’an şûn de û bi avabûna navend û dezgehên çap û weşanê di Kurdistanê de heta niha liv û lebata çandî didome, lê nabe eva jî were ji bîr kirin ku bandora xebata azadîxwazî û demokratîk a gelê Kurd rasterast an neraserast li ser geşekirina civatên han hebûye.

Di 3 dehsalên borî de, kar û çalakiyên navend û civatên han di Kurdistana Îranê de di çarçoveya lidarxistin û birêvebirina bi dehan kongire, festîval, semînar, bibîranîna wêjevan û nivîskaran û her wiha civînên cur bi cur ên çandî, edebî û hunerî de dixuye ku di tev bajar û bajarokên Kurdistana Îranê de meşiyane.

**Hevwelatiyên dilovan!**

**Wêjevan, helbestvan, nivîskar û xwedî pênûsên hêja!**

Navenda çandî, edebî û hunerî ya Wêjan, avabûna xwe îlan dike. Erkê sereke yê vê navendê lêkolîn û dahûrandin e di warên ziman, edeb û wêje, huner û warên cur bi cur ên hizrî û ronakbîriyê de.

Me xezîneyek ji kar û tekoşîna hemû civatên çandî û edebî heye ku dikarin vê gerrê di navendekê de li dûrî welat, hewlên xwe micidtir bikin û di vê pêxemê de jî hevkarî û hevrêyiya hemû Kurdên welatparêz e ku di karê me di birêvebirin û pêşdebirina erkê ser milê me de qahîm û qahîmtir bike.

Di rastî de me ji xala sifran de dest pê nekiriye, belku em ji xalên serkevtinê ve de dest bi kar bûne û par û keda we jî di vê tekoşînê de xuya û parastî dimîne. Em her ji niha de daxwaza hevkarî û hevrêtiyê di vî warî de ji we dikin.

**Navenda Çandî, Edebî Û Hunerî Ya Wêjan**
**Pûşpera 1388’an**
**Hezîrana 2009**

www.agirikurdi.org

# Têkoşera Nependî Sînem Cegerxwîn



**Suad Cegerxwîn**

Gava min bîr bir, min xwe di nav malbatek siyasî de dît, demên malbatê bi tevahî di kar û xebatên netewî, civakî û mirovî de dihatin borandin. Bav, bira û xûşka min bi awayekî fireh kar û xebatên xwe dikirin, yên mayî jî di wê demê de hîn zarok bûn. Ez dixwazim li vir hinekî li ser xebata xûşka xwe bisekinim, heya ku wek mînak ji xebata jinên kurd re di wê dema tund û dijwar de bê xuyakirin. Civata me kurdan herdem civateke kevneşop e, tim li dijî kar û xebata jinan derdikeve, bi wateyek din em bêjin serdem ya mêra ye û ta niha jî wilo ye. Civak bi xwe tevgera jinan bi sînor dike û wan ji piraniya mafên xwe bêpar dihêle.

Di wê demê de çend jinên çeleng û jêhatî beste sînorên civakê şikandin û daketin qada kar û xebata giştî. Yek ji wan jinan, xûşka min Sînem e. Navê wê Sîmensat bû û jêre digotin Sînem, ew zaroka mezin di malbata cegerxwîn de bû. Li tenişta bavê min û ligel tevgera wê demê bi kar û xebateke dijwar, bi bawerî, bi awireke dûr û kûr li pirsên civakî xwedî derdiket, baweriya wê bi wekheviya her du celeban dihat. Her wisa bi pirsa netewa kurd û rizgariya gelê kurd Ji bo mafê mirovan, ji hemû gelên bindest re di pêşî de gelê kurd, ji bo civateke azad û serbest ligel hevalên xwe tekoşîneke dijwar di nav rêxistina komonîstî de dikir. Di wê demê de (sala 1950) ew rêxistina tekane bû, her mirovekî/ê bixwesta bi karê siyasî ve mijûl bibe, dibû endamê/a wê rêxistinê. Sînem bi payebilindî, bi bawerî û bi tundî, kar û xebat dikir, qet tirsa desthilata zorker nedikete dilê wê, ji ber ku baweriya wê bi kar û xebata wê dihat.

Sînemê gavên mezin avêtin: Gava pêşî di nav malbatê de bû, ya duyemîn ji di nav civatê de. Wê ligel çend jinên hevalên xwe ji bo rizgariya civatê û jinan bang kirin, protêsto kirin, xwepêşandan amade kirin, serê polîsên zorker şikandin, herdem belavok belav dikirin û li ser dîwara dixistin, 8’ê Adarê pîroz dikirin, tax bi tax digeriyan, axavtin, civîn û konferansên jinan amade dikirin, bê tirs ji bo azadiya jinan qîr û bang dikirin. Sînem kete zîndanê, lêdan û pîkol xwarin, lê tu carî, ji dîtinên xwe venedigeriya, ne li hevalên xwe jî mikur dihat, gellek cara dûrî mala xwe dima, lê tu carî jî sist nedibû.

Sînem herdem bi bavê min re civata malê digerand, tevî devjenkên siyasî û civakî bi giftûgoyên vekirî bi bawerî gel hevala dibû. Sînem jina Kurd ya yekemîn bû ku di wê demê de, şoreş li ser civatê çêkir, dergehê kar û xebatê ji jinan re vekir, lingên wê ketin feleqê û bi xerezanan lêdixistin, lê herdem ew bi serbilindî dîtina xwe ji wan re digot û berxwe dida. Sînem ji hemû aliyan ve hat êşandin, him ji desthelata zorker, him jî ji civata xwe. Li şûna ku nîşana pêvekin, aferîkê bidnê, civata kurda ew di nav pirsan de dorpêç dikirin da ku xwe ji karê xwe vekişîne, lê Sînem bi daxwazeke tund pêşve diçû, roj bi roj encamên kar û xebata wê û hevalên wê yên jin belutir dibû. Guhertineke mezin di civatê de çêbû, jinan cihê xwe di nav rêxistinan de îdî dîtin, xwe bihêz kirin, daxwaz û dîtinên xwe pêşve birin, ew dem bû mînak ji pêşeroja jinan re.

**Sînem jina Kurd ya yekemîn bû ku di wê demê de, şoreş li ser civatê çêkir, dergehê kar û xebatê ji jinan re vekir**

Ji Sînem min gelek pesin sitandin, ez jê hînî kar û xebata netewî û karê ji bo pirsa jinan bûm, ez jê hinekî hînî xwendina kurdî bûm, ji ber ku di wê demê de Sînemê bi tîpên latînî dinvîsand û dixwend, gava helbestên bavê min di nav livînan de dixwendin û pêre hêstirên wê dihatin xwar (aferîn sed aferîn Qazî Mihemed aferî) û (ronakî çavêm, pêtî çiraxim, çaxim nemaye îdî çira xem) û (sê zarok xweş tên, bi deng û qêrîn, dengê perîşan, perî û şêrîn)û hwd. Ez jî pêre digiriyam, wê ji min dipirsî tu çima digrî? Min digot, ma tu çima digrî? Digot gava tu mezin bibî tê zanibî çima! Ez hêvîdarim demên pêşerojê ji we re xweştir bin û hûn di Kurdistaneke azad de bijîn.

Bi rastî keçeke payedar bû, têkoşer bû û zanîbû çi dixwaze. Sala 1957’ê, Sînem li gel bavê min û hevalên wê yên din ji bo pirsa netewî, ji Komonîsta dûr ketin, gellek bîranînên min pêre hene, ji ber ku ez bêhtirî cara pêre bûm, carna jî ez bi xwe re dibirim civînên xwe, lê ez dixwazim tenê bêjim ku Sînemê gellek ked û nirx da, lê tiştek nestand, bû goriya civata kurd, bû goriya dîtin û baweriyên paşketî, bû goriya me jinan. Cemîle Bû heyrda kurda û bêdeng winda bû û di nav pirsgirêkên civata me yên dijwar de nema xuya bû, ji ber wê ku jineke pêşketî bû, di civata me de nehat pejrandin. Lewma li Bexdadê bi xortekî Ereb yê pêşverû re şû kir û jiyana xwe bi kul û sewl dûrî welatê xwe berdewam kir û ligel armanc û hêviyên xwe, ligel şevbest û xemên xwe, ligel derûna xwe ya kurdî, bi bîranînên xwe yên xemgirtî di nava axa Bexdadê de li ser riya Kurdistanê (daxwaza wê bû ku li kurdistanê bê veşartin) hat veşartin. Di wê demê de daxwaza wê pirr dijwar bû, lewra jî li ser riya Kurdistanê hat veşartin, ew têkoşera pendî û nependî winda bû.

Lê ez dibêjim: Xûşka min a delal, ey fenera geş di rojên tarî de, ey pertava civaka kurd, ey gula malbata Seyda, çalaka mafên jinan, navê te qet nepenî namîne. Dê rojek bê civaka Kurdî navê te bibîr bîne û bi tîrêjên agir li ser asîmanê Kurdistanê binivîsîne. Dê rojek bê ku jinên kurd te di nav dîroka tekoşîna jinan de, têkoşereke pendî bibînin, kar û xebata te qet winda nabe. Ev rêça ku em îro têde diçin, encama kar û xebata te û hevalên te ye, tu dê herdem di dilê me de bijî û dê ji me re bimînî sembola tekoşînê.

www.arsivakurdi.org

agiri

**Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@gmail.com**



## Ednan Hesenpûr Bi 10 Salan Cezayê Girtîgehê Hate Mehkûmkirin




Ednan Hesenpûr, rojnamevanê girtî yê Kurd ku berê bi cezayê îdamê hatibû mehkûmkirin, ji aliyê Dadgeha Şoreş a bajarê Sine ve bi 10 salan cezayê girtîgehê hate mehkûmkirin. Bi vî awayî, piştî 2 salan girtinê, cezaya îdamkirina Ednanê rojnamevan betal bûye û vê carê 10 sal cezayê girtîgehê li wî hatiye birrîn.

Leyla Hesenpûr xwîşka Ednan Hesenpûr û berdevka Kampayna Piştevanîkirin ji Ednan Hesenpûr, di vê derbarê de got: “Roja 01.07.2009an, Sîrwan Hûşmendî, yek ji parêzerên birayê wê, di pêwendiyeke telefonî de nûçeya derkirina 10 sal cezayê girtîgehê piştî dadgehîkirina navhatî di kereta duyem de, ragihande malbatî wî”.

Li gor gotina Leyla Hesenpûr, Ednan hêj di girtîgeha bajarê Sine de ye.

Rêxistina Nûçegihanên Bêsînor dibêje ew mehkûmkirine tiştekî bêwate ye û divêt Ednan Hesenpûr serbest bihê berdan

## Bengdariya Bi Komyuterê, Xeterek Di Boseya Bikarînerên Wê De



Cîhana bedew balkêş a Kompyuterê xeterên tayber bi xwe hene. Televîzyoan Farsî ya BBCyê, raporek balkêş di vê derbarê de weşand û diyar kir, hinek ji bikarînerên vê alavê nikarin bêy wê bijîn. Li Ewropayê nêzîk 3 ji sedê a ciwanên navbera temenê 12 heta 18 saliyê bengdar(mutad)ê înternetê ne û di hinek welatên Asyayî weke Çîn, Taywan û Kureya Başûr de rewş ji vê xirabtir e. Ev cure kesane di rojê de, nêzîk 10 seet ji dema xwe ya azad mijûlê karkirina bi kompyuter û înternetê ne. Karnasên vê warê nigeranê vê rewşê ne û ditirsin ku kesên ku bengdarê Kompyuter û înternetê dibin, rastî pirgirêkên pîskolojîk û ruhî bibin.

## 20 Kes Di Girtîgeha Recayî Şehrê De Hatin Daliqandin



Malpra “iranpressnews”ê ji zarê Nûçegihaniya Fransa li Tehranê eşkere kir, roja şemî, 3’ê Tîrmeha 2009’an, 20 kes li girtîgeha Recayî Şehr a bajarê Kerec li Îranê hatin îdamkirin. Hefteya borî jî aliyê kêm 12 kes ên din di girtîgeha Êvînê û bajarê Qumê de hatibûn daliqandin.


Tê gotin ev îdamên zaf, li bere berê serhildan û nerazîbûnên berfireh ên vê dawiyê yên xelkê Îranê, bi armanca pêkanîna rewşa û etmosfera tirs û xof û wehşetê di civakê de tê meşandin,

## Bilûra Herî Kevin A Cîhanê Hate Kifşkirin



Cihwarnasan bilûra herî Kevin a cîhanê ku 35 hezar sal berî niha hatiye çêkirin, kifş kirin. Ev bilûra 3 hen e û ji aliyê komeke cihwarnasên dîrokî ên Zanîngeha Tobîngn a Almanya ve li Başûrê Rojavayê vî welatî hate peydakirin.

Bi vî awayî, hejmara bilûrên kifşbûyî li vê dewre ji dîroka mirovan gihîşt 8 heban. Beşek ji van bilûrane bi hêstiyê teyran hatiye çêkirin. Eva vê yekê nîşan dide ku muzîk yek ji sedemên pêkhatina civakên mezin bûye û çand û huner nirxek zaf hebûye.




Nûçe û dengûbasên nû li ser pirsên siyasî, aborî, civakî û çandî yên Rojhilatê Kurdistanê bi zimanên Kurdî û Farsî li ser malpera kurdistanmedia.com bixwînin...

www.arsivakurd.org